hejmar 5 havîn 1989

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

Civîna Biskops Arnöyê li Swêdê

Civîna pêncemîn a li ser zaravayê kurmancî li Stockholmê, roja 1ê nîsana 1989an dest pê kir û heta 9ê nîsanê dewam kir.

Hevalên ku di civînê de beşdar bûn ev bûn; Khosrow Abdollahî (Selmas), Rojen Barnas (Diyarbekir), Lutfî Baksî (Xerza), Firat Cewerî (Mardîn), Xelîl Dihokî (Dihok), Mustafa Düzgün (Dersîm), Derwêş M.Ferho (Tor), Musa Kaval (Hekarî), Hazim Kiliç (Hekarî), Asî Rebatî (Sulêmanî), S. Rêwing (Sêrt), Kendal Nezan (Diyarbekir), Huner Salem (Akrê), Mehmed Uzun (Swêrek), Memo Yetkîn (Semsûr) û Reşo Zîlan (Agirî).

Civîn, li gora bernameya xwe, hem li ser pirsgirêkên rêzimanî û hem jî li ser terman xebitî. Herwekî ku hûn dê di rojnamê de bibînin, civîn bi firehî li ser du pirsgirêkên dijwar yên rêzimana kurdî rawesta: lêkerên hevûdudanî û raweya neyînî. Ji bilî van pirsgirêkan, civîn li ser devoka Behdînî jî xebitî. Lê em rapora vê xebatê ku ji aliyê S. Rêving hat pêşkêş kirin, di Kurmancî de naweşînin, ji ber ku ew di kovara Federasyona Kurd li Swêdê Berbangê de (hejmar 4/88) weşiyaye.

Heçî term bin civînê xebata xwe ya li ser anatomiya meriv, peyvên şal û şepik û peyvên ku cih nîşan didin domand û dest bi termên hiqûqî kir. Di beşa *«Ji klasîkên me»* de, vê carê, dor ya şaîrê nemir Seyda Cigerxwîn bû.


Ev xebata ku roj bi roj hin çêtir û tekûztir dibe, îroj bêtir bala xwendevanên kurd dikişîne û ew jî bi pêşniyar û dîtinên xwe, vê xebatê hîn dewlementir dikin. Em her li hêviya pêşniyar û dîtinên xwendevanan in.

KURMANCÎ

Anatomiya mirov

(dûmahîka hejmara 3an)

kurdî	*tirkî*	*fransizî*	*îngilîzî*
22-41 BEDEN	**GÖVDE**	**LE TRONC**	**TRUNK**
22-25 PIŞT	SIRT	LE DOS	BACK
22- mil, serpî, sermil	omuz	l'épaule	shoulder
23- pî	kürek kemiği	l'omoplate	shoulder blade
24- navpişt, kodika piştê	bel	les lombes	loins
25- kortikên qorikê, kortikên kemaxê	kıç çukuru	les fosses lombaires	small of the back
26- binçeng, binkefş	koltuk altı	l'aisselle	armpit
27- pûrtê binçengê, mûyê binçengê, pirça binçengê	koltuk altı kılı	les poils, axillaires	armpit hair
28-30 SÎNG, PÊSÎR	**GÖĞÜS**	**LE THORAX**	**THORAX (CHEST)**
28-29 memik, çiçik	meme	le sein	Breasts
28- sermemik, gupika memikê	meme ucu	le mamelon	nipple
29- xala memikê	ayla	l'aréole	aréola
30- navçiçik, navmemik, sersîng	göğüs	la poitrine	bosom
31- navteng, newq	bel	la taille	waist
32- kêlek	yan, böğür	le flanc	flank (side)
33- qorik, kemax	kalça	le hanche	hip
34- navik	göbek	le nombril	navel
35-37 ZIK	**KARIN**	**L'ABDOMEN** (le ventre)	**ABDOMEN** (stomach)
35- serzik	karın üst bölgesi	l'épigastre	upper abdomen
36- til	alt karın	l'hypogastre	abdomen
37- binzik, zikê piçûk	göbek altı	le bas-ventre	lower abdomen
38-berran	kasık	l'ain	groin
39- berzik, rûv, rêv	ferç, etek	le pubis	pudenda (vulva)
40- qûn, gurmik, tilmiqûn	kıç	la fesse	seat (backside, coll, bottom)
41- qelişteka qûnê	kıç yolu	le sillon, inter fessier	anal groove, anal cleft
42- qurmiçka qûnê	kıç kırışığı	le sillon sous fessier	gluteal fold



43-54 ENDAMÊN, LAŞÎ	**UZUVLAR, KOL VE BACAKLAR**	**LES MEMBRES**	**LIMBS**
43-48 ÇENG, MIL, ÇEPIL, PÎ	**ÜST UZUV**	**LE MEMBRE SUPERIEUR**	**ARM**
43- bend, pazû	kol	le bras	upper arm
44- qurmiçka enîşkê	dirsek kırışığı	le pli du coude	crook of the arm
45- enîşk	dirsek	le coude	elbow
46- zend, bask, bazend	bilek, alt kol, önkol	l'avant-bras	forearm
47- dest	el	main	hand
48- kulm, mist,	yumruk	le poing	fist (clenched clenched hand) fist,girmist
49-54 LING, QOR	**BACAK**	**LE MEMBRE INFÉRIEUR**	**LEG**
49- ran, hêt	bud	la cuisse	thigh
50- çok, jinû	diz	le genou	knee
51- binçok, binjinû	diz altı	le creux poplité	popliteal space
52- çîp, çîm	bacak	la jambe	shank
53- paq, baq	baldır	le mollet	calf
54- pê	ayak	le pied	foot

Lêkerên hevedudanî

(verbes composés)

Amadekar : Rojen BARNAS

Di kurmancî de du cur lêker hene ku ya pêşî lêkerên bingehîn in. Lêkerên bingehîn, besît in ku di gewda lêkerê di halê mesderî (infinitif) de perçeyên dîtir wekî navdêr (ism/substantif), rengdêr (sifet/adjectif), hoker (zerf/adverbe), pronav (zemir/pronom), pêrkît (préfix) an parkît (suffix) tune ne. Gewda lêkerê ya di halê mesder (infinitif) de xwerû ye.

Cura diduyan lêkerên hevedudanî (verbes composés) ne, ku gewda lêkerê bi piranî ji lêkerek û ji pêrkîteke xwerû an ji pêrkîteke hevedudanî, ji navdêrekê, ji rengdêrekê, an ji hokerekê pêk tê.

LÊKERÊN HEVEDUDANÎ YÊN

A. Tofa Pêşîn

1. Lêkerên hevedudanî yên ku ji pêrkîteke xwerû û ji lêkerekê pêk tên:

da : dadan, dahatin, daketin, daweşandin, dakirin.
hil : hilanîn, hilavêtin, hilawistin, hildan, hilkirin.
ra : rabûn, rakişandin, rakirin, raxistin.
ve : vebûn, vedan, vejîn, vekirin, vekuştin, veniştin.
vê : vêketin, vêxistin.
we : weşandin.
wer : wergirtin, wergerandin.

2. Lêkerên hevedudanî yên ku ji pêrkîteke hevedudanî û ji lêkerekê çêdibin.

Pêrkîtên hevedudanî

jê = ji + wê/wî
lê = li + wê/wî
pê = bi + wê/wî
tê = di + wê/wî

Herwekî tê dîtinê pêrkîtên hevedudanî ji daçekek û ji pronavek pêk tên.

LÊKERÊN HEVEDUDANÎ YÊN JI JÊ, LÊ, PÊ, TÊ ÇÊBYÎ:

jê : jêkirin
lê : lêkirin
pê : pê vedan
tê : têderxistin, têgihandin, têgihîştin, têxistin.

Rastnivisîna lêkerên hevedudanî yên ku bi jê, lê pê û tê çêdibin:

a) Di lêkerên mîna jêkirin, lêkirin, têgihîştin ku pêrkîtên wan hevedudanî ne û di laperandinê de ev pêrkît ji hevûdu nabişifin, divê pêkve bêne nivisandin.
Herwekî:
lêkirin (ava kirin, nivîsîn): Min dîwar lêkir.
Min xanî lêkir.
Ez xanî lêdikim.

b) Di lêkerên ku pêrkîtên wan ên hevedudanî di laperandinê de ji hev dibişifin, divê pêrkît ji lêkerê cihê bête nivisandinê.
Herwekî:
bar lê kirin: Min barê xwe li kerê kir.

3. Lêkerên hevedudanî yên ji pêrkîteke navdêrî, rengdêrî an hokerî û ji lêkerekê çêdibin.

Pêrkît herçend wek navdêr/rengdêr an hoker xwiyan bike jî, li vê derê erka wê êdî ne navdêrî/rengdêrî an hokerî ye, lêbelê tiqûtenê pêrkîtbûn e. Ji ber hindê pêrkît jêderka wê ji çi cur gotinê hatibe bila were, bi lêkerê ve tê nivisîn.

PÊRKÎTA

<u>Lêkera hevedudanî</u>	<u>hokerî</u>	<u>navdêrî</u>	<u>rengdêrî</u>	<u>lêker</u>
berdan	ber	-	-	+ dan
berketin*	ber	-	-	+ ketin
çêbûn	-	-	çê	+ bûn
çêkirin	-	-	çê	+ kirin
derkirin	der	-	-	+ kirin
derxistin	der	-	-	+ xistin
girêdan	-	girê(k)	-	+ dan
rêdan	-	rê	-	+ dan
rêkirin**	-	rê	-	+ kirin
rokirin	-	ro	-	+ kirin
rûdan	-	rû	-	+ dan
rûniştin	-	rû	-	+ niştin

* *berketin* lêkereke hevedudanî ye, bi/li ber ketin biwêjeke (tabîr) lêkerî ye.
** rêkirin lêkereke hevedudanî ye, bi rê kirin biwêjeke lêkerî ye.

Xusûsiyetên laperandina lêkerên vê tofê:

a) Di laperandina zemanên fermanî (imperatif), dahatû (futur), bilaniya bûrî (imparfait du subjonctif) û şertê bûrî (conditionel 1ère forme) de; berlêkera bi-nayê bikaranîn.
Herwekî:
Çêke, rabe, lêxe. Ne ku: Çêbike, rabike, lêbixe.
Ezê çêkim, ezê rabim, ezê lêxim.
Min çêkira, ez rabûma, min lêxista.
Minê çêkira, ezê rabûma, minê lêxista.

b) Berlêkera di- wek qaîdeyek gelemper tê ber koka lêkera eslî.

Herwekî:

rabûn

gewda lêkerê	:	rabûn
pêrkît	:	ra
koka lêkerê/ lêkera eslî	:	bûn
paşlêker	:	-n
rabûn	:	ez radibim, ez radibûm.
çêkirin	:	ez çêdikim, min çêdikir.

Lê wek îstisna li hin navçeyên mîna Bişêriyê, Hevêrkan û Torê ev berlêkera di- di pêşiya gewdê de wekî ku lêkereke xwerû be tê bikaranîn.
Herwekî: dirabim, dirabûm, dilêxim.
c) Di laperandina neyînî (négation) ya lêkerên vê tofê de berlêkerên neyîniyê wekî me-, ma-, ne- dikevine navbera pêrkîtê û lêkera eslî.
Herwekî: Ez ranabim, ez ranedibûm, ezê ranebim, ramebe, bila ranebe.
B. Tofa diduyan
Lêkerên hevedudanî yên vê tofê ji navdêrekê an rengdêrekê û ji lêkerekê pêk tên.
1. Navdêr an rengdêr + lêker:

Ava bûn	Ava kirin
Hazir bûn	Hazir kirin
Pîr bûn	
Qaîl bûn	Qaîl kirin
Vala bûn	Vala kirin
Av dan	
Guh dan	
Mikur hatin	
Rast hatin	
Limêj kirin	
Nas kirin	

2. Lêker + navdêr, rengdêr an hoker

Anîn cih
Çûn ava
Dan pey
Ketin pey
Kirin der

Di laperandina (kişandina) teşeyên erînî û neyînî de ya tê laperandine lêker bi xwe ye, perçeyên dinê yên wekî navdêr, rengdêr an hoker nayên laperandinê. Di rastnivîsîna lêkerên hevedudanî de gava lêker bin hêmanên lêkerê ji hevûdu cihê, gava navdêr bin pêkve têne nivîsîn. Herwekî:

<u>Lêker</u>	<u>navdêr</u>
Av dan	avdan
Rast hatin	rasthatin

BIWÊJÊN (TABÎRÊN) LÊKERÎ *(locution verbales)*

Biwêjên lêkerî ji hêmaneke lêkerî çi xwerû an hevedudanî û ji çend hêmanên dinê yên nelêkerî pêk tên. Ev hêman wekî pêşdaçek (préposition), paşdaçek (postposition); pronav, rengdêr an jî navdêr in.

ji lêkerên tabîrî çend numûne:

Biwêja lêkerî	Navdêr
Bin av bûn	binavbûn
Li hev ketin	lihevketin
Bi hev ketin	bihevketin
Li ber xwe ketin	liberxweketin
Hatin ser xwe	
Lê geriyan	lêgerîn
Bi rê ketin	birêketin
Ji hev danîn	
Li ber ....dan	
Dev jê berdan	
Dest pê kirin	
Baweriya xwe (pê) kirin	
Bala xwe dan	
Ji bîr rakirin	
Berê xwe dan	
Dnîn ber hev	

JI KLASÎKÊN KURDÎ

Ferhengoka Dîwana Cegerxwîn

-I-

Amadekar : Khosrow ABDOLLAHÎ

Di çerçewa bernameya xebata li ser afirandinên klasîkên kurdî em di vê hejmara **Kurmancî** *de ferhengokeke* **Dîwana Cegerxwîn** *belav dikin. Ev ferhengok li ser bingehê Dîwana yekem hatiye pêk anîn. Eslê peyvên ku ne xwerû kurmancî ne di nav kevanekê de hatiye nîsan dan :*

A

Abidar *(f.)* avdar, bi av, pirr bi av; zebeş abidar e; bi av e.
Aheng miqam, melodî
An *(f.)* ew, ewa
Ap mam
Arezû *(f.)* daxwaz, xwezî
Asitan *(f.)* erd, cîh
Ateş *(f.)* agir
Ateşîn *(f.)* agirîn, pirr ji agir
Avanî avahî
Awaz deng, awazê bilûrê:dengê bilûrê
Ayîn rêç, dîn; ayînê Kurdan yê berê zerdeştî bû.

B

Bad ba; bayê havînan pirr gurr nîne.
Badegîr *(f.)* meygir
Balafir firoke, teyare
Barî Xwedê, Barî Teala, *(e.)* xwedêyê mezin
Bazîn bezîn
Başok épervier *(fr.)*
Bedgo (bed gotin), pîsî-bêj, dev-pîs
Bedxwaz xêrnexwaz, pîsîxwaz
Bêgan bêgane: biyanî
Behîv badem *(f.)*, amande *(fr.)*
Behmen 1) navê yekemîn Şahê bine-mala keyaniyan, 2) navê firişteyekê ye di dînê zerdeştî de.
Behram 1) navê serdarekî pirr bi nav û deng ê zemanê Hormozê Çaharan şahê Sasaniyan e. 2) navê stêrkekê ye 3) navê firişteyeyekê ye di dînê zerdeştî de.
Benc beng, giyayê bengê
Bende kole,
Ber hasil, ber birin serî: hasil kirin
Ber kevir; di ser me de ber dibarin: di ser me kevir dibarin
Berbadî çûn berbad bûn, ji dest çûn
Berberî îxtîlaf, duberekî
Beyaban, biyaban çol
Beşt kêran
Bêmirês bê mirûz, bê sikûm
Bênîn bîn kirin, gulê bibênin : gulê bîn bikin
Bêserî bê xwendan, bê serok û bê rehber
Bêş 1) bac: filan kes hate bêş kirin : bac ji wî hate stendin, 2) maliyat, filan kesê bêşa xwe daye : filan kesê maliyata xwe daye.
Bi hezar rengî bi hezar awayî
Bihuşt bêhişt, cinnet *(e.)*
Bijarte élite *(fr.)*

(e.) : erebî ; *(f.)* : farisî ; *(fr.)* : fransizî ; *(t.)* : tirkî

Bil xeynî, ji bil we: ji xeynî we

Bin-den şeraba binê kûp, den: kûp

Bosîn maç kirin

C

Cam *(f.)* **qedeh** *(e.)* piyana mey vexwarinê ye.

Canbazî can fida kirin, can gorî kirin

Cejne-rojî cejna rojîtiyê, cejna remezanê

Ceng şer

Cengebazî şer û oxilme, şerê bi deng û feng

Ceres *(e.)* zengil

Cewcam *(e.)* zarok

Cewdik meşkeke piçûk e ji bo avê

Cihangîr cihangir

Cihok, ciw coya avê

Ciwanmêr comerd, camêr

Coş *(f.)* kel, av coş hatî : av keliyayî

Ç

Çal bîr, çala avê, çala genim

Çalak jîr, jêhatî

Çeleng jêhatî, jîr

Çendan hewqas, ew çendan rê çû heya westiya: ew hewqasî rê çû...

Çeng *(f.)* harp, haletekî mûsiqiyê ye

Çengal, çengel çetel

Çeşm *(f.)* çav

Çikûs dest girtî, mirovekî çekûs : mirovekî dest girtî: dest nevekirî

Çirax *(f.)* çira

Çogan çel, hol

D

Daberizîn êriş kirin, hemle kirin

Dafik kemîn, ew kete dafikê : ew kete kemînê

Dahî *(e.)* pirr jîr, jêhatî

Dehen *(f.)* dev

Dewa *(f.)* derman

Deşnam *(f.)* cinêw, çêr, deşnam dayîn, cinêw dayîn

Dilawer mêrxas

Dilxurt bi tehemûl

Difr, difre xurûr

Dixan *(e.)* dûkel

Diyar *(e.)* cîh, war

Dîbace *(f.)* pêşgotin

Dîdar dîtin

Dîden *(f.)* dîtin

Direfş *(f.)* ala

Dot keç; dotmam : keçmam

Duzex dojeh : doje : cihennem

Dûd *(f.)* dû, dûkel

E

Ebrû - qezeh birû kevan

Ebrû birû

Ehremen, ehrîmen Xwedê yê nebaşî û pîsiyê

Ehûramezda Xwedê yê başiyê û qenciyê

Ejder 1) marekî mezinî efsaneyî ye ku agir ji devê wî derdiket,

Em ev, eva

Emro îro

Enguşt *(f.)* tilî

Engûr *(f.)* tirî

Enîroj eniya wê wekî rojê

Erdeşêr, Erdeşîr yekemîn Şahê Xanedana Sasaniyan

Erjen navê yekek ji pirtûkên Manî ê pêxember e ku wênekeşekî bi nav û deng bû jî.

Erqem *(e.)* çîn, neqş

Erx co, kanal

Evor heywanê nêçîrê, gibier *(fr.)*

Eyran Îran, navê îranê yê kewn

F

Fehetkar fedîkar, şermezar

Felat rizgarî

Ferfûr porselen

Ferzîn wezîr e di leyistoka Şetrencê de

Fexregah *(e.)* cîhê ku mirov pê fexrê dike

Feryad *(f.)* qîrîn

Firengî ewropayî

Firing Ewrûpa

Fixan *(f.)* qîrîn

Fort pesn; fortan di xwe dan: pesnê xwe dan; vantardise *(fr.)*

G

Geda parsek

Gedek kurr

Gerdenxwar stûxwar

Gerdûn asiman, kainat *(e.)*

Gerdûş 1) geran: ew çûye gerdûşê: çûye geranê, 2) zivirîn, asiman di gerdûşê de ye: di zivirînê de ye.

Germesûk qumaşê kêm qîmet, kincir

Gêş ref, komik

Girbêj bêjinga bi qulên girtir

Guft gotin, axavtin

Guftego *(s.)* diyalog

Guhreş Kûroş *(f.)*, Şahekî bi nav û deng ji xanedana Hexamenişî ku di 559-530 pêş mîladê li Îranê hukum kiriye Cyrus le Grand *(fr.)*

Gulşen gulzar

Guzar geşt û seyran

H

Heçî darekî du çiqile (Y) ku dixin serê werîs de

Hemdem heval

Hemnişîn *(f.)* hemdem

Hêl, hêle nêçîra bi grûpî; battue *(fr.)*

J

Jan êş, derd

K

Kamiran *(f.)* xweşbext

Kaxik vazoya kulîlkan, pôt *(fr.)* aux fleurs, vase *(fr.)*

Kaşo darê gogê

Kerkere nezan, tênegihîştî

Kelax îskelet, squelette *(fr.)*

Kelbeş kerbeş

Keleş rêbirr, eşqiya

Kelxot bê didan, kesekî ku didanên wî ketine

Kenişt *(f.)* dêra cihûyan, sînagog

Kepez cîhê bi gir û girik

Kerx westiyayî, bê hêz, ji hêz ketî

Key keybir, kêreke mezin

Kêşim bejn û bal

Kiçik piçûk

Kîrgo kêroşk

Kopal gurz

Kuca *(f.)* kuder, kîjan der

Kulek yê ku dikule

Kûp û bel bandêva çiyê; pic de montagne *(fr.)*

L

Lacerem *(e.)* bi neçarî

Laf pesnê xwe dan, fort

Lakin *(e.)* lê

Leb *(f.)* lêv

Lebaleb *(f.)* tijî, limlimî

Lem'an *(e.)* pêt, alav

Lîs ciyê ku çûk û teyr xwe lê datînin; perchoire *(fr.)*

M

Mader *(f.)* dê, dayik

Mah *(f.)* hîv

Mahweş *(f.)* mah - hîv, weş wekî, mahweş wek hîvê

Manend *(f.)* wekî

Marmij 1) yê ku jehra mar dimije, 2)kesê bê wijdan kedxurî dike, xelkê dişêlîne.

Matem *(f.)* şîn, reş, matem girtin, reş girtin

Max kêran, 1) traverse, poutre (f.r), 2) ode

Medhoş, medhûş *(f.)* bê hiş ketî, ji xwe ve çûyî, medhoş bûn: ji xwe ve çûyîn

Mend kas bûn, ji hêz ketin

Merdane bi mêrxasî, bi camêrî

Merdî camêrî

Mersef sinî

Mestane *(f.)* bi serxwoşî

Meyger	kesê ku di meyxanê de meyê di gerîne, saqî
Meyza kirin	mêze kirin, nêrîn
Mêlak	kezeb (kezev)
Mijde *(f.)*	mizgînî
Mirdal	mirdar
Mirdû *(s.)*	mirî
Miskar	kaniya ava madenî
Mitêl, mitîl	lihêf
Mîtan	mîntan, kiras
Moxil	cureyek bêjingê
Murx *(f.)*	mirîşk, teyr, murxê bazî, teyrê bazî
Muxbeçe	zarokên ku di zemanê berê de di meyxanan de meygirî dikirin.
Mûdî	şûm, bedyûm

N

Nagah *(f.)*	nişkave
Nagehan *(f.)*	nişkave
Namidar *(f.)*	navdar, bi nav û deng
Naqos *(e.)*	zengil
Nasazî	nesazî
Nasufte *(f.)*	qul nekirî
Naşor	perçeyê ji rîsê zirav
Nebîrbir	kure-fem
Nemerd	bêbext, ne camêr
Nepax	pifik an tifik a hesinkeran, soufflet *(fr.)*,
Nermî	musamaba, tolerance *(fr.)*
Nêrdewan	derence, pêlekan
Nêrîz	cureke xencer
Nihan	nihên, veşartî
Nijdevan	rêbirr, rêgir
Nik	cem, ba, nik min: cem min, ba; min
Nuxwurî, nûxwirî	zaroyê yekemîn

P

Paketeb' *(k+e.)*	pak+teb': paqij tînet
Pare *(f.)*	pirtî, pare pare bûn, pirtî pirtî bûn
Pargon, pargûn	coyeke piçûk e ku li dora kon, çadir an her tiştekî din vedidin, ji bo ku ava baranê neçe hindur.
Parsek	kesê ku parsê dike
Parsîw	parsû
Paye	derece, paya mamostatiyê
Pehlewan	mirovekî pirr xurt û bi qewat
Perwane, pervane *(f.)*	minminîk, pepûle, pirpirok
Perwa	tirs; bê perwa: bê tirs, bê minet
Pesendîde *(f.)*	baş, bijartî
Peyam *(f.)*	mesaj, wilam
Peyk *(f.)*	qasid
Pêlek	demek, qasek
Pêrgî	berve çûn; ez çûbûm pêrgîya wî: ez ber wî ve çûbûm.
Pêtazî	pêxas
Pêyxam *(f.)*	mesaj
Pêşrew	pêşeng
Pişkoj	hebin, bendê ku davêjin serê sing û bi wî kon girêdidin
Polad	pola
Pûtxane	cîhê pûtan

Q

Qad	meydan, cih, erd
Qadûk	beroşeke piçûk
Qed û qamet *(e.)*	bejn û bal
Qend	şekir
Qeraş	aşvan
Qerij	qirêj, gemar
Qerpal	1) cilên kevn û ji hev ketî, 2) li ser hev û din de kom-bûn û kevnare bûn
Qerqef	surahî, cama şerabê
Qewî *(e.)*	xurt, qewîn
Qews û qezeh *(e.)*	keskesor
Qirak	qijika reş
Qunbere, Qurix	stêrkeke ku durust di nîveka havînê de der dikeve û pirr ji bi şemal e.
Qutb *(e.)*	serok, ji hemûyan mezintir

R

Rastgo	rastbêj
Raz *(f.)*	sirr
Reftar *(f.)*	tevger, helwest
Reg	reh, bê reg: bê reh
Rencber, rêncber	zehmetkêş, emekdar
Rewa	cayiz
Rêberî	rehberî
Ritbe *(e.)*	derece, paye
Rîp	fêl, hîle
Robar	çem
Rojcebîn *(k+e.)*	enî ya wê wekî rojê ye
Rux *(f.)*	rû
Ruxsar *(f.)*	rû, sûret
Rûmah *(f.)*	rûyê wê wekî hîvê ye
Rûnpêj	tawe, miqilik, rûnbirêşk
Rûro, rûroj	ruyê wê wekî kilora rojê ye
Rûsiyahî *(f.)*	rûreşî

S

Sade	hêsan, hêsayî, besît
Sahibqiran *(e.)*	hukumdarê mezin
Sehergahan *(f.)*	bi wextê serê sibê
Sehrebaz	sêrbaz, cadûbaz
Senc	strî yên dara sincê
Seng *(f.)*	kevir
Serenguşt *(f.)*	serê tiliyê
Serheng *(f.)*	mîralay; colonél *(fr.)*
Sersal û nûroj	newroz
Serdar	serok; généralissime *(fr.)*
Serşok	cîhê ku mirov têde serê xwe dişo, banyo *(fr.)*
Seza	şerm, e'yb, nebaş, ji bo we pirr seza ye: ji bo we pirr şerm e
Sêwî	êtîm, belengaz, bêxwedan
Siyehgûnpoş *(f.)*	wekî reş li xwe kirî
Sifirne	sîvander
Sikke *(e.)*	polik
Siyah *(f.)*	reş
Siyahçerd *(f.)*	reşolekî
Sîma *(f.)*	rû, sûret
Sîwak *(e.)*	miswaka erebî ku hecî ji hecê tînin û pê didanên xwe paqij dikin
Stêle	beradayî
Surşirîn	dilrevîn
Suxen *(f.)*	peyv, axavtin
Sûxte *(f.)*	şewitî (ji derdan)

Ş

Şadî	şahî
Şanî dan	nîşan dan
Şax *(s.)*	çiya
Şeb *(f.)*	şev
Şebnem *(f.)*	xunav
Şecaet *(e.)*	dilêrî, mêrxasî
Şek	derb, şekek lê da, derbek lê da
Şekeramîz *(f.)*	şekirdar
Şel	şil, nexweşiya şilbûnê
Şekerxend *(f.)*	şekir ken
Şewişîn	muwazena xwe winda kirin, perdre l'équilibre *(fr.)*
Şewq û tereb *(e.)*	şahî û xweşî
Şext	şexte, perçe perçe bûn
Şeyda *(f.)*	bê tewat, evîndar
Şeyl *(e.)*	hal û hereket
Şêrîn	dengê kewê nêr gava ku dixwîne
Şêt *(s.)*	dîn; şêt bûn: dîn bûn
Şikêr	kevirên gir ên li ser hev di çiyan de

T

Tar	tarî
Tazî *(f.)*	ereb
Taçîk	tacîk, faris
Tebeqe *(e.)*	qat
Tebîb *(e.)*	doxtor, bijîşk
Teblîx *(e.)*	reklam, nasandin
Telebkar *(e.+k.)*	deynxwaz
Temezî	sermala rengîn a ku keç û jin li dora kofiya xwe dialînin an dialandin
Ten	beden, laşê mirov
Tenha	tenê, bi tenê
Terbûş *(e.)*	şaşik
Terş	heywanên kedî kirî
Terx	bê qusûr, bê 'eyb
Tewizîn	têk çûn
Text û pa	hukum, seltenet
Teylesan *(e.)*	1) şaşika dora kumê melan, 2) xirx
Têrmal	zengîn, dewlemend
Tifaq *(e.)*	hevgirtin, yekîtî
Tiral	tembel
Tîx *(f.)*	keybir, teraşa (cilêta) ku mirov pê rihê xwe diteraşe

Tog	bêheya, effrontée *(fr.)*
Tol	jina daw ne paqij, jina doxîn sist
Tor û tey	tim û tim
Torîk	çeqel; chacal *(fr.)*
Tûre, torre *(e.)*	bisk, serê biskan

V

Vebestin	careke din girêdan
Vejîn, vejiyan	vejiyandin, careke din zindî bûn an zindî kirin
Vewestan	rawestan
Vîn	evîn

W

Waris *(e.)*	mîratxwer
Wer	eger, heke

X

Xak	ax; xaka Kurdistan: axa Kurdistan
Xaltîk	xatî, xûşka dayika mirov
Xame *(f.)*	qelem, pênûs
Xan û sera	koşk û qesr
Xap	xapîn, fêl
Xedeng	tîreke rast û dirêj ku ji dara gezê dihate çêkirin
Xerîdar *(f.)*	muşterî, kiriyar
Xeste *(f.)*	1) nexweş, 2) westiyayî
Xezan *(f.)*	payîz
Xeşm *(f.)*	hêrs, pertî; brutalité *(fr.)*
Xişt	zeng, şîşa ku serê wê tûj e
Xol	xwelî
Xubar, Ẍubar *(f.)*	toz
Xuda	Xwedê
Xumpare *(f.)*	mêrkuj; meurtier *(fr.)*
Xurd *(f.)*	xwarin
Xurşîd *(f.)*	tav, hetav
Xwedan	Xwedî, xweyî, sahib
Xweser	1) otoriter (fr.), despot *(fr.)* 2) otonom
Xweserî	1) otorîtarîzm,despotîzm *(fr.)*, 2) otonomî *(f.)*
Xweşnewaz *(f.)*	xweş aheng

Ẍ

Ẍed-dar *(e.)*	zordar, stemkar
Ẍemhilgir *(e.+k.)*	kesekî ku xema kesên din dixwe an dikişîne
Ẍemze *(e.)*	1) bijang, 2) naz û tîz
Ẍemzerim *(e.+k.)*	bijangrim, bijang wekî rimê
Ẍerîq *(e.)*	xeniqî
Ẍezeb *(e.)*	hêrs, bela
Ẍunce, Ẍunçe *(f.)*	bişkoja gulê

Y

Yadigar *(f.)*	diyarî
Yar	heval, dost
Yekser	hemû, pêkve, têkre
Yeksû *(f.)*	1)yekalî, 2) wekhev
Yeẍma, yexma *(f.)*	talan, yexma kirin, talan kirin
Yexsîr	dîl, êsîr
Yezd Gurd	şahek ji şahên xanedana Sasaniyan
Yezdan	xwedê di dînê Mezdayî de

Z

Zaẍ *(f.)*	qijika reş
Zehr *(e.)*	gul
Zehr *(f.)*	jehr, jar
Zendî	zindî, zindû, jîndar
Zinnar *(e.)*	kemerbend
Zingar	jeng
Zuhd *(e.)*	xwe parêziya dînî

Ji pirsgirêkên rêzimanî
R a w e y a n e y î n î

Amadekar: Reşo ZÎLAN

Di zaravayê kurmancî de raweya neyînî ya perçeyên axaftinê yên wek bernav, rengdêr, hoker, daçek, navdêr, gihanek, baneşan û hwd bi alîkariya pirtika neyînî ya ne-yê têne çêkirin. Di rewşên holê de pirtika ne-yê serbixwe ye, cihê û bi tena serê xwe tête nivîsîn. Di raweya neyîniyê de pirtika ne-yê her tim têtê pêşiya parçeya axaftinê ya ku divê bête neyînî kirin. Bo nimûne:

Raweya erînî	Raweya neyînî
Yê ku ew gotiye, ez im.	Yê ku ew gotiye, ne ez im
Av sar e.	Av ne sar e.
Ma tu sibehî diçî gund?	Ne sibehî, lê dusibehî.
Ev diyariya ji bo min e?	Na, ew ne ji bo te ye.
Ew zeviya han zeviya Dara ye.	Ew zevî ne zeviya Dara ye.
Zîzê weke te kej e.	Zîzê ne weke min, lê weke Fodilê kej e.
Lo, lo!	Ne lo lo, lê lê!

Awarte: Di hin devokên kurmancî de, di rex vî awayê han yê jorîn de, awayekî din yê raweya neyînî jî heye. Heçî ew rawe ye, herwekî hin zaravayên din yên kurdî, bi alîkariya nînê ve têtê çêkirin. Ev gelek caran yan hema bi dû rengdêr, hoker, daçek, navdêr, gihanek, baneşan û hwd re têt yan jî diçe dawiya hevokê. Herwekî pirtika ne-yê, nîne jî peyveke serbixwe ye û cihê û bi tena serê xwe têtê nivîsîn. Bo nimûne:

Lîloz ew nîne.
Av sar nîne.
Ew zevî zeviya Dara nîne.
Lo lo nîne, lêlê ye!
Na, ew ji bo te nîne.
Rojbûna min sibehî nîne, dusibehî ye.
Ew bi şekir nîne.

Lê herwekî emê piştre jî çêl bikin, nîne bi xwe raweya neyînî ya hebûnê ye, ango: nînbûn, tunebûn. Ji lewre jî ew li gor bernavan têtê tewandin.

Neyîniya bi vî awayî, hem di zimanê axaftinê û hem jî bi teybetî di zimanê nivîsandinê de hin tevlihevî û aloziyan tîne pêş. Bo nimûne, heke Kurmancek ji hêla bakurê Kurdistanê bibêje «Konê min nîne.» dê Kurmancek ji hêla Botan, Toriyan, Behdînan û hwd welê têbigihê, ku ew dibêje «Min kon nîne.» ango «Konê min tune ye.».

Ji ber vê têkilhevî û aloziyê, divê em hewil bidin da ku bi kêmanî di zimanê nivîsandinê de vê forma han ya neyîniyê nehête bi kar anîn.

RAWEYA NEYÎNÎ YA LÊKERA «BÛN»ê

A. Dema niha

Herwekî ku li jorê jî diyar dibe, pirtika neyînî ya ne-yê her tim têtê pêşiya perçeyên axaftinê yên têvel. Ew her dîsan serbixwe ye. Di hevokan de,

cihê û bi tena serê xwe ye û wilo jî têtê nivisîn. Ew li gor bernavan nahête tewandin. Lê herwekî ku li jêrê jî dixuyê, guhartoya devokî her tim li gor bernavan têtê tewandin. Di pêkhatineke weha de êdî ew rola lêkereke neyînîkiri dilîze. Wek:

1. Li gor qaideya **bêdeng** - d**engdar** - **bêdeng** (B+D+B):

Raweya erînî	**Raweya neyînî**	**Guhartoya devokî**
Ez cotkar im.	Ez ne cotkar im.	Ez cotkar nînim.
Tu şagirt î.	Tu ne şagirt î.	Tu şagirt nînî.
Ew gavan e.	Ew ne gavan e.	Ew gavan nîne.
Em Kurd in.	Em ne Kurd in.	Em Kurd nînin.
Hûn sazbend in.	Hûn ne sazbend in.	Hûn sazbend nînin.
Ew çûk in.	Ew ne çûk in.	Ew çûk nînin.

2. Li gor qaîdeya **dengdar** - **bêdeng** - **dengdar** (D+B+D):

Ez gundî me.	Ez ne gundî me.	Ez gundî nînim.
Tu bajarî yî.	Tu ne bajarî yî.	Tu bajarî nînî.
Ew rovî ye.	Ew ne rovî ye.	Ew rovî nîne.
Em zane ne.	Em ne zane ne.	Em zane nînin.
Hûn akincî ne.	Hûn ne akincî ne.	Hûn akincî nînin.
Ew çiyayî ne.	Ew ne çiyayî ne.	Ew çiyayî nînin.

Carina hin kes, gava ku forma guhartoya devokî bi kar tînin, wê lêkera tewandî ji hev vediqetînin û wek lêkereke hevedudanî, cihê dinivîsin. Bo nimûne:

1. Li gor qaîdeya **B+D+B**	2. Li gor qeîdeya **D+B+D**
Ez cotkar nîn im.	Ez gundî nîn im.
Tu şagirt nîn î.	Tu bajarî nîn î.
Ew gavan nîn e.	Ew rovî nîn e.
Em Kurd nîn in.	Em zane nîn in.
Hûn sazbend nîn in.	Hûn akincî nîn in.
Ew çûk nîn in.	Ew çiyayî nîn in.

Heçî pirtika *im*, *î*, *e*, û *in* e, mirov dizane ew tewangên lêkera *bûn*-ê ne. Lê heçî pirtika *nîn* e, wek xuya ye, rola pirtika neyîniyê dilîze. Lê bele herwekî ku jê jî darî çav dibe, di guhartoya devokî ya neyîniyê de qaîdeya «D+B+D» derbas nabe. Ango lêkera *bûn*-ê li gor dengdarê berî xwe, yê ku di hevokê de, pêwîstî tewandinê nabe. Ji ber ku nîne bi bêdeng dest pê dike, tewanga lêkera bûnê jî, her li gor qaîdeya «B+D+B»-yê dimîne.

Eşkere ye, ku nîne ji «nebûn»ê têt. Ji nebûnê re, di hin devokên kurmancî de, dibêjin nînbûn... Her çi be, heke ev forma han carina ji ber neçariyê bête bi kar anîn jî, divê pirtika nîn-ê bi lêkera bûn-ê ve bête nivîsîn.

DI DEMÊN LÊKERAN DE RASTNIVÎSÎNA NEYÎNIYÊ

B. Dema pêş

Raweya erînî	**Raweya neyînî**	**Guhartoya devokî**
Ez ê bibim.	Ez ê nebim.	Ez ê nînbim.
Tu ê bibî.	Tu ê nebî.	Tu ê nînbî.
Ew ê bibe.	Ew ê nebe.	Ew ê nînbe.
Em ê bibin.	Em ê nebin.	Em ê nînbîn.
Hûn ê bibin.	Hûn ê nebin.	Hûn ê nînbin.
Ew ê bibin.	Ew ê nebin.	Ew ê nebin.

Li vir, pirsa sereke ya ku ji aliyê rastnivîsînê de derdikeve pêşiya me, ew e: aya em ê pirtika NE-yê, wek li jorê, di gel lêkerê, pêkve binivîsîn? Yan divê em wê, wek li jêrê, cihê û bi tena serê xwe binivîsin? Ango:

Ez ê ne bim.
Tu ê ne bî.
Ew ê ne be.
Em ê ne bin.
Hûn ê ne bin.
Ew ê ne bin.

Têbînî: Herçendî ji aliyê pêkhatina zimanê kurdî de cihê nivîsandina vê pirtikê rastir be jî, ku piraniya zimanên hindoewrûpî welê dinivîsin, di pêk ve nivîsandinê de feyde bêtir e. Sûd û feydeya herî mezin, bê guman ya pedagojîk e. Pêkve nivîsandina pirtika neyîniyê hem di nivîsandin û xwandin, hem di bilêvkirin û hem jî di hînkirinê de hêsanî kû gengaziyên gelekî mezin derdixîne.

C. Dema boriya berdest

	Raweya erînî	**Raweya neyînî**
	Ez dibûm	nedibûm
	Tu dibûyî	nedibûyî
	Ew dibû	nedibû
	Em/Hûn/Ew dibûn	nedibûn
D. Dema boriya têdeyî		
	Ez bûm	nebûm
	Tu bûyî	nebûyî
	Ew bû	nebû
	Em/Hûn/Ew bûn	nebûn
E. Dema boriya çîrokî		
	Ez bûbûm	nebûbûm
	Tu bûbûyî	nebûbûyî
	Ew bûbû	nebûbû
	Em/Hûn/Ew bûbûn	nebûbûn
F. Dema boriya dûdar/sade		
	Ez bûme	nebûme
	Tu bûyî	nebûyî
	Ew bûye	nebûye
	Em/Hûn/Ew bûne	nebûne
G. a) Reweya hekînî: Dema borî I		
	Ez bûma	nebûma
	Tu bûya(yî)	nebûya(yî)
	Ew bûya	nebûya
	Em/Hûn/Ew bûna	nebûna
G. b) Dema borî II		
	Ez ê bibûma	ê nebûma
	Tu ê bibûya(yî)	ênebibûya(yî)
	Ew ê bibûya	ê nebibûya
	Em/Hûn/Ew bibûna	ê nebibûna
H. a) Raweya bilanî: Boriya berdest.		
	Ez bûbiwam	ne bûbiwam
	Tu bûbiwa	ne bûbiwa
	Ew bûbiwa	nebûbiwa
	Em/Hûn/Ew bûbiwan	nebûbiwan
H. b) Dema niha û pêş I		
	Ez bibim	nebim
	Tu bibî	nebî
	Ew bibe	nebe
	Em/Hûn/Ew bibin	nebin
H. c) Dema niha û pêş II		
	Ku ez bim	nebim
	Ku tu bî	nebî
	Ku ew be	nebe
	Ku em/Hûn/Ew bin	nebin

1. Raweya fermanî

a) Yekhejmar

Bibe! (be!)	nebe !
	mebe !

b) Pirhejmar

Bibin! (bin!)	nebin !
	mebin !

Têbînî: Di zaravayê kurmancî de du cure raweya fermanî hene. Yek ji wan bi alîkariya pirtika me-yê tête çêkirin, ya din jî bi alîkariya pirtika ne-yê. Ferqa di navbera wan de ev e: «ME» her tim ferman e û fermaneke misoger e. Lê di ne-yê de tawsiye heye. Mixa bin, ku îro li ba hin Kurmancan me bi temamî asîmîle bûye û di şûna wê de bi tenê ne û forma bi wê tête çêkirin, maye.

LÊKERA «HEBÛN»-Ê

A. Dema niha

Raweya erînî	Raweya neyînî	Lêkera alternatîv
Min heye	min nîne	... min tune
Te heye	te nîne	... te tune
Wî/Wê heye	wî/wê nîne	... wî/wê tune
Me/We/Wan heye	me/we/wan nîne	... me/we/wan tune

B. Dema pêş

Min dê hebe	min dê nînbe	... min dê tune be
Te dê hebe	te dê nînbe	... te dê tune be

C. Dema boriya têdayî

Min hebû	min nebû	... min tune bû
Te hebû	te nebû	... te tune bû

D. Dema boriya çîrokî

Min hebû	min nebû	... min tune bû
Te hebû	te nebû	... te tune bû

E. Dema boriya dûdar

Min hebûye	min nebûye	... min tune bûye
Te hebûye	te nebûye	... te tune ye

F. a) Raweya hekînî; dema borî I

Min hebiwa	min nebiwa	... min tune bûya
Te hebiwa	te nebiwa	... te tune bûya

F. b) Dema borî II

Min dê hebiwa	min dê nebiwa	... min dê tune bûya
Te dê hebiwa	te dê nebiwa	... te de tune bûya

G. a) Raweya bilanî; boriya berdest

Min hebe	min nînbe	... tune be
Te hebe	te nînbe	... tune be

G. b) Dema niha

Min hebe	min nînbe	... min tune be
Te hebe	te nînbe	... te tune be

H. Raweya fermanî

Hebe!	Mebe!
Hebin!	Mebin!

LÊKERA «HEYÎN»Ê

A. Dema niha

Raweya erînî	Raweya neyînî
Ez heme	tune me
Tu heyî	tune yî
Ew heye	tune ye
Em/Hûn/Ew hene	tune ne

B. Dema boriya têdayî

Ez hebûm	tune bûm
Tu hebûyî	tune bûyî
Ew hebû	tune bû
Em/Hûn/Ew hebûn	tune bûn

C. Dema boriya dûdar

Ez hebûme	tune bûme
Tu hebûyî	tune bûyî
Ew hebûye	tune bûye
Em/Hûn/Ew hebûne	tune bûne

D. Boriya çîrokî

Ez hebûm	tune bûm
Tu hebûyî	tune bûyî
Ew hebû	tune bû
Em/Hûn/Ew hebûn	tune bûn

E. Dema pêş

Ez dê hebim	dê tune bim
Tu dê hebî	dê tune bî
Ew dê hebe	dê tune be
Em/Hûn/Ew hebin	dê tune bin

F. a) Reweya hekînî; dema borî I

Ez hebûma	tune bûma
Tu hebûyayî	tune bûyayî
Ew hebûya	tune bûya
Em/Hûn/Ew hebûna	tune bûna

F. b) Dema borî II

Ez dê hebûma	dê tune bûma
Tu dê hebûyayî	dê tune bûyayî
Ew dê hebûya	dê tune bûya
Em/Hûn/Ew hebûna	dê tune bûna

G. a) Raweya bilanî; Boriya berdest

Ez hebûbiwam	tune biwam
Tu hebûbiwa	tune biwa
Ew hebûbiwa	tune biwa
Em/Hûn/Ew hebûbiwan	tune biwan

G. b) Raweya bilanî; Dema niha û pêş

Ez hebim	tune bim
Tu hebî	tune bî
Ew hebe	tune be
Em/Hûn/Ew hebin	tune bin

G. c) Dema niha û pêş II

Ku ez hebim	ku ez tune bim
Ku tu hebî	ku tu tune bî
Ku ew hebe	ku ew tune be
Ku em/hûn/ew hebin	ku em/hûn/ew/ tune bin

H. Raweya fermanî

Hebe!	mebe!
Hebin!	mebin!

RAWEYA NEYÎNÎ YA LÊKERAN

A. Dema niha

Da ku mirov lêkereke ku li gor dema niha hatiye tewandin bike raweya neyînî, divê mirov pirtika di ku pirtika dema niha ya lêkeran e, hilde. Di şûna wê de pirtika neyînî ya na-yê, ku lêker bi bêdengekê dest pê bike, yan jî bi tenê n -yê, ku lêker bi dengdara «a»-yê dest pê bike, bi lêkerê ve binivîse. Bo nimûne:

Lêker	Raweya erînî	Raweya neyînî	Raweya Fermanî Neyînî
Kirin	Ez dikim	nakim	
	Tu dikî	nakî	meke!, neke!
	Ew dike	nake	
	Em/Hûn/Ew	dikin nakin	mekin!, nekin!
Nivîsîn	dinivîse	nanivîse	menivîse!, nenivîse!
Sûtin	disû	nasû	mesû!, nesû!
Jiyan/Jîn	dijî	najî	mejî!, nejî!
Barîn	dibare	nabare	mebare!, nebare!
Qajîn	diqaje	naqaje	meqaje!, neqaje!
Xwarin	dixwe	naxwe	mexwe!, nexwe!
Alastin	dialêse	nalêse	mealêse!, nealêse!
Eşîn	diêşe	naêşe	meêşe!, neêşe!
Iskîn	dîiske	naîske	meîske!, neîske!
Orîn	diore	naore	meore!, neore!
Ûrîn	diûre	naûre	meûre!, neûre!
Enirîn	dienire	naenire	meenire!, neenire

LÊKERÊN HEVEDUDANÎ

Dil şikandin	dil dişkêne	dil naşkêne	dil meşkêne!, dil neşkêne!
Lê xistin	lê dixe	lê naxe	lê mexe!, lê nexe!
Pê şêwirîn	pê dişêwire	pê naşêwire	pê meşêwire!, pê neşêwire!
Jê rijandin	jê dirije	jê narije	jê merije!, jê nerije!
Tê dan	tê dide	tê nade	tê mede!, tê nede!
Vexwarin	vedixwe	venaxwe	vemexwe!, venexwe!
Dadan	dadide	danade	damede!, danede!
Raxistin	radixe	ranaxe	ramexe!,ranexe!
Derketin	derdikeve	dernakeve	dermekeve!, dernekeve!
Wergirtin	werdigire	wernagire	wermegire!, wernegire!
Hilavêtin	hildiavêje	hilnavêje	hilmeavêje!, hilneavêje!

Hin ji Kurmancan, raweya neyînî ya lêkerên bi pêşpirtikên wek bi «ra-, ve-, der-, hil-» û hwd ve hevedudanî ne lê di tewangê de ji hev nahêne veqetandin, her yekser pirtika na-yê bi serê lêkerê ve dinivîsin. Bi vî rengî raweya neyîniyê çê dikin. bo nimûne:

vexwarin	navexwe
raxistin	naraxe
wergirtin	nawergire

Lêkerên wek «karîn» û «zanîn»-ê bi pirtika ni-yê têne neyînî kirin. Wek;

Zanîn	dizane	nizane	mezane, nezane!
Karîn	dikare	nikare	

B. Dema pêş

Raweya neyînî, di gişt demên pêş yên hemû lêkeran de (karîn û zanîn ne têde), her bi alîkariya pirtika «NE»-yê têne çêkirin. Wek;

Lêker	Dem	
Çûn	ez ê	neçim
		neçûma
		neçûbim

C. Dema borî

Hemû lêker, lêkera zanîn û karîn ne têde, di gişt demên borî de bi alîkariya pirtika ne-yê têne neyînî kirin. Bo nimûne;

Kirin	min	nekir
		nedikir
		nekiriye
		nekiribû

TERMÊN HIQÛQÎ

Amadekar : Musa KAVAL

kurdî	*tirkî*	*fransizî*	*îngilîzî*
Kes	şahıs	personne	person
Kesane	şahsî	personnel	personal
Kesî	şahıs	personnel	personal
Kesahî	şahsiyet	personnalité	personality
Netewe	ulus	nation	nation
Neteweyî	ulusal	national	national
Neteweyîtî	ulusallık, millilik	carectère national	nationhood
Neteweperwer	ulussever, ulusçu	nationaliste, qui aime sa nation	nationalist
Neteweparêz	ulusçu, milliyetçi	nationaliste, qui défend sa nation	nationalist -
Neteweparêzî	ulusçuluk, milliyetçilik	nationalisme	nationalism
Neteweperest	koyu ulusçu, şöven milliyetçi	chauvin	chauvinistic
Navneteweyî	uluslararası,	international	international
Gelemper	genel	général	general
Bi gelemperî	genellikle, genel olmak	généralement	generally
Giştî	kamu	public	public
Giştî	genel	général	general
Civat	toplum	société	society
Civatî, civakî	toplumsal	social	social
Exlaq, sinc	ahlak	morale, ethique	ethics
Seredan	görüşme	visite	visit
Danberhevî	karşılaştırma	comparaison	comparaison
Dan ber hev	karşılaştırmak	comparer	to compare
Bi dananberhevî	karşılaştırmak	comparé	compared
Peyketin	takib	poursuite	pursuit, prosecution
Dad	adalet	justice	justice
Dadî, qeza	adlî, tûzel	judiciaire	judicial
Hiqûq	hukuk	droit	law
Hiqûqî	hukuksal	juridique	juridical
Qanûn	kanun	loi	law
Hiqûqê neteweyî	ulusal hukuk	droit national	national law
Hiqûqê navneteweyî	uluslararası hukuk	droit international	international law
Hiqûqê giştî	kamu hukuku	droit public	public law
Hiqûqê danberhevî	karşılaşktırmalı hukuk	droit comparé	compared law